# Werin em metirsiya li ser têkoşîna jina Kurd hîs bikin

Jina Kurd ev nêzî sed salî ye ku ji bo maf û azadiyên xwe têdikoşinê dike û di vê rêyê de gelek hilbûn û daketin çêbûn û bûn sedem ku têkoşîna ji bo mafên zayendî bê paşxistin û gelek caran jî bûne qurbaniya rewşên siyasî û bo heyamek zêde dengê wê nemaye..

dom»R:8



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (471) 04-06-2024 Buha (1000) Tûmen*

# Tijîkirina cihê "Serjêkerê Têhranê" û danîşandana rewabûna sîstemê

Mirina Îbrahîm Reîsî, Serkomarê rejîma Îslamî a Îranê, li pey xwe re rewşek aloz û alingarîyên mezin bo rejîmê pêkanîn e û bala hemû aliyekê ji dostan û nayerên rejîmê kişandiye ser wan tiştên ku li Îranê de diqevimin.

Mirov dikare kartêkeriya nemana Reîsî li 3 qadên siyaseta derve, navxweyî û rikeberiya navbera aliyên rikeber di hundirê rejîmê de, wek 3 qadên giring, şirove bike û bide zelalkirin ku ew yeka dikare çi fersend û ...........

dom» R:4

# Dema wêye em bên bihîstin!

Piştî rojekê ji êrişên diron û mûşekî yên Îranê bo ser Îsraîlê, David Cameron Wezîrê Derve yê Brîtanya piştî serdana xwe ya Îsraîlê ragihand ku êdî hemû cîhan naveroka rejîma Îranê dizane û dizane ku ew rejîme êrîşkar û metirsîdar e. Bi salan beriya êrîşa Îranê ya li ser Îsraîlê di 13ê Nîsana 2024 de, Îranê bi rêya terorîzma dewletê, êrîşên li ser kampên penaberên Rojhilatî, navendên partiyên kurdî û carcaran êrîşên li ser berjewendiyên Amerîkayê yên li hundirê Iraqê û başûra Kurdistanê, ceribandibû.

dom» R:6

# Rêzdar "Mistefa Hicrî bi hilkefta "Roja Girtiyên Siyasiyên Kurdistanê" peyamek belav kir

**Deqa peyamê wiha ye:**

Li bîranîna 59 ciwanên bidarvekirî yên Mihabadê li heyva Cozerdana 1362 a Rojî û binavkirina roja qewimîna vê tawana bi sam a komara Îslamiya Îranê bi "Roja Girtiyên Siyasiyên Kurdistanê", tevî bilindragirtina yada wan şehîdan, silava emegnasiyê bo îradeya qahîm û xweragiriya girtiyên siyasî li Rojhilatê Kurdistanê dişînin.

Bê guman, girtiyên siyasiyên Kurdistanê ji aliyek hêmaya zindîbûn û berdewamiya xebat û têkoşîna netewa me ye, ji aliyê din ve, selimanderê îradeya berdewam a takên şoreşgêr û xwedî bawerên Kurdistanê ye ku zîndan û îşkence û tawanên dujmin, nekariye berxwedana wan bişkêne û wan serê xwe li pêxema azadiya niştîman û armancên pîroz ên tevgera Kurdistanê bilind ragirtine.

Cangorîkirin û xweragiriya we cihê şanaziyê ye!

**Mistefa Hicrî**
**Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**11ê Cozerdana 1403 a Rojî**



**Rêzdar "Mistefa Hicrî bi hilkefta "Roja Girtiyên Siyasiyên Kurdistanê" peyamek belav kir**



# Çavên ku bo "Refeh"ê digirîn, derheq Kurdistanê kor in

N. Serbest Urmiye

Pitir ji nîv salê ye ku gerra nû ya şer di navbera Îsraîl û taqimên şerxwaz ên Felestînê yên girêdayî bi "Hemas"ve ku rejîma Îslamî ya Îranê piştevaniyê ji wan dike, didome.
Şerê ku piştî êrîşa bi navê "Bahoza El Eqsa" ya ku di roja 7'ê Oktobera 2023'an a Zayînî de ji aliyê taqima "Ezedîn Qesam" a girêdayî bi rejîma Îrane ve bo ser xelkê sivîl yê Îsraîlê destpêkir.
Di heyamê ku şer li herêma "Xeze" a Felestînê de berdewam bû, ji bo ku xelkê sivîl li zirarên zêde yên şer were parastin, artêşa Îsraîlê daxwaz ji xelkê sivîl kir ku li herêma bi ewle ya "El Mewasî", akincî bin.

dom» R:5



# Hilbijartin, gendelî û şikandina keramet

N. Kerîm Perwîz

Rêkxirava navnetewî ya destpakiyê li watekirina çemka gendeliyê de wiha dibêje: "Gendelî ji mifahvergirtina xirab ji berpirsayetî li pêxema berjewendiya kesîn pêk hatiye. Gendelî baweriyê ji nav dibe û dêmokrasiyê lawaz dike û astengan dêxe ser rêya geşekirina aborî û herwisa bêdadî û hejarî û cudatiya qatî li civakê û kirîzên civakê dijwartir dike!
Li warê aborî ve li sîstema hikûmî û heta rêkxiravên ne-hikûmî de li cîhana sêyem û bi atybet li Rojhilata navîn de heye, gendeliya rohn û eşkere ye ku heta vê astê ku xwe weke adetê civakê dide xuya!
Li cîhana belalêdayî de, gendelî heta astekê berfireh bûye û toyê xwe belav kiriye ku ew kesê berpirs e gendeliyê zêdetir dike bi zîrektir û bi şiyantir tê dîtin û wek mîrateke giştî tê mêzekirin û ew berpirsê ku digel sîstema gendeliyê rêk nekeve wek saza nekok ya li nav orkestrayê de mêze dikin û demfon ...........

dom» R:3

# Peyama Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokarat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 12ê Cozerdanê, roja girtiyên siyasiyên Kurdistanê

**Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokarat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 12ê Cozerdanê, roja girtiyên siyasiyên Kurdistanê, peyamek belav kir**

**Girtiyên Siyasiyên Kurd!**

**Malbatên girtiyên siyasî!**

Bi hilkefta 12ê Cozerdanê, roja girtiyên siyasiyên Kurdistanê, tevî bi bîranîna yada girtiyên ezîz ên bidarvekiriyên me, bi gelek rêzdariyê ve spasiya xweragiriya we yên berxwedêr li nav girtîgehên her du rêjîmên paşayetî û komara Îslamiya Îranê dikin.

12ê Cozerdanê ku ji aliyê “Encumena Girtiyên Siyasî yên Rojhilatê Kurdistanê” ve wek “Roja Girtiyên Siyasiyên Kurdistanê” hatiye diyarîkirin, bi bîrhênerê rojeke tal li dîroka xebata rizgarîxwaziya gelê me ye.

Sala 1362 a Rojî, li vê rojê de 59 ciwanên bajarê Mihabadê ku pêştir ji aliyê rêjîma nûbidesthilatgihîştiyê komara Îslamî ve bê ti tawanekê û bi tenê bi tohmeta Kurdbûn û hevkarî digel rêkxiravên siyasiyên Kurdistanê, sizaya bidarvekirinê bi ser wan de hatibû sepandin, li bajarê Tewrêzê de hatine gullebarankirin.

Gullebarankirina wan ezîzan li demekê de bû ku çendîn kes ji wan, hêj temenê wan jêr 18 saliyê de bû û negihîştibûne temenê yasayî. Ew 59 ciwanane, ne li dadgeheke eşkere de hatine dadgehîkirin û ne mafê hebûna parêzêr bi wan nehate dan, heta piştî gullebarankirina wan, termê wan radestî malbata wan jî nekirin û heta niha jî nehatiye zanîn ku li kîderê bi axê hatine spartin.

Hevdem hilbijartina mirina serbilindane ya wan ezîzan û serîneçemandin li hemebr mirovkujên komara Îslamî de bûye remza xebata girtiyên siyasiyên Kurdistanê û hemû salan li vê rojê de rêz ji nav û yada wan û hemû girtiyên siyasiyên Kurdiatanê




tê girtin.

Îsal li demekê de em 12ê Cozerdanê bi bîr tînin ku “Îbrahîm Reîsî” yek ji celadên girtîgehên rêjîmê ku roleke serekî li bidarvekirna girtiyên siaysî de hebû û yek ji endamên “Heyeta Merg” li bidarvekirina hezaran kesî li sala 1367 a rojî de bû, li bûyera kevtinexwarê ya hêlîkopterekê de ji nav ço. Heq bû ku “Reîsî” berî mirinê bo dadgehê hatiba rapêçkirin û sizayê wan hemû tawanênan jî wî hatiba vergirtin.

Lê mixabin ew derfeta bo malbatên cergşewitiyê bidarvekiriyan nema. Hivî dikin li paşerojeke nêz de tevahiya wan kesên ku li îşkencekirin û bidarvekirina girtiyên siyasiyên Kurdiatanê û Îranê de rol hebûne, bînin nav dadgehan û sizaya tawanên xwe vergirin.

Girtiyên xweragir ên siyasî, malbatên serbilind ên girtiyên siyasî, hûn wek beşeke girîng a meydana xebata gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê li her du rêjîmên pehlewî û komara Îslamî, erkek giran li ser milê we bûye û heye.

Gelek ji we, mixabin bi salan e ku temenê xwe li nav girtîgehan de li pêxema rizgariya gelê xwe de êxsîrê destê dujminan bûne û bi xweşiyê ve, bi rûyek sipî û seriyek bilind jê derketine, gelek ji we her niha jî li nav girtîgehên komara îslamî de bi seriyek bilind sekinîne û heyamê sizaya nedadperweraneya xwe derbas dikin.

Bi giştî we xweragiran hem serê xwe bilind ragirtiye û hem jî li nav gelên azadîxwaz de bûne cihê şanaziya gelê xwe.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li vê rojê de careke din, tevî rêzgirtin ji xebata we ezîzan, bi dil û can, spasiya keda we û malbatên we yên serbilind dike.

Hiv dikin ku lidemekî nêz de berhema keda we û tevahiya xebatkarên doza rizgarîxwaziya gelê me bidest ve bê û tevî azadiya we û rizgariya yekcariya gelê me ji bindestiyê, bi hevre xebat bo avakirina civakek bextewer bikin.
Silav bo rihê paqijê şehîdên 12ê Cozerdanê û hemû girtiyên siyasiyên bidarvekirî.

**Silav li îradeye girtiyên siyasiyên xweragir û malbatên wan ên serbilind.**

**Navenda Birêveberiya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**

**31ê Gulana 2024 a Zayînî**

# Hilbijartin, gendelî û şikandina keramet



**N. Kerîm Perwîzî**
**W. Bêhzad Simko**



Rêkxirava navnetewî ya destpakiyê li watekirina çemka gendeliyê de wiha dibêje: “Gendelî ji mifahvergirtina xirab ji berpirsayetî li pêxema berjewendiya kesîn pêk hatiye. Gendelî baweriyê ji nav dibe û dêmokrasiyê lawaz dike û astengan dêxe ser rêya geşekirina aborî û herwisa bêdadî û hejarî û cudatiya qatî li civakê û kirîzên civakê dijwartir dike!

Li warê aborî ve li sîstema hikûmî û heta rêkxiravên ne-hikûmî de li cîhana sêyem û bi atybet li Rojhilata navîn de heye, gendeliya rohn û eşkere ye ku heta vê astê ku xwe weke adetê civakê dide xuya!

Li cîhana belalêdayî de, gendelî heta astekê berfireh bûye û toyê xwe belav kiriye ku ew kesê berpirs e gendeliyê zêdetir dike bi zîrektir û bi şiyantir tê dîtin û wek mîrateke giştî tê mêzekirin û ew berpirsê ku digel sîstema gendeliyê rêk nekeve wek saza nekok ya li nav orkestrayê de mêze dikin û demfonî û harmoniya têk daye û dibe ji holê bê rakirin! Yasa li wir de berewajî ye: Sîstem gendel e û takê berpirsyarê dije gendelî, bi dije sîstemê tê dîtin û divê ji kar bê derxistin! Li vê kultûra giştî ya gendeliyê de, rêjîma wialyeta feqîh wek çavkanî û maka ne tenê gendeliyê, belkû pergala hemû gendeliyek xwe nîşan dide û heta li şerê berjewendiyê de jî li nav bandên xwe de gendeliya bi hezaran milyardî eşkere dibe, rêber tê ser xet û fermanê dide ji vê zêdetir midyayîkirina vê nedomînin! Çimkî li vê sîstema gendeliyê de, gendelî bi xwe tawan nayê hisêb belku midyayîkirina vê bi tawaneke gelek qirêjtir tê nîşandan.

Lê xirabtir ji gendeliya aborî û mifahvergirtina xirab ji berpirsayetiyê, diyardeyeke din a bi nvaê ji rêderxistina hilbijartinan û li rastiyê de dizîkirin û destêverdan li deng û îradeya dengderan e ku ji gendeliya aborî û mifahvergirtina xirab ji berpirsayetiyê jî xirabtir e.

Gendelî li 2 tiştan gelek vêzare:

Yekem: ji mîdyayîkirin û li rastiyê de ji rohnî û destpakiyê bêzar e û her çi qas li odên daxistî de bimîne, rêya sazan û perdepoşkirina û nanbiqerdanê peyda dike û her çi qas bigîhîje nav ragihandin û hizra giştî, bêzartir dibe û ji eşkerebûna rastiyan bo xelkê nigeran e!

Duyem: gendelî ji paqijkirina sîstemê û hatina ava taze bo nava golê, bêzar e, çimkî hêdî hêdî bi hatina berpirsên nû ku bi hilbijartina serrast û ji aliyê xelkê ve hatibine hilbijartin, nigeran e û ji wan bêzar e, çimkî nûbûn û dengê azadiya xelkê û hilbijartina kesên din, wek derbaskirina ava paqij û çavkaniya pak bo nav gola avê û vekirina rêya derbasbûnê ye ku golekê tevlî çem dike û ava nû, jiyaneke nû dide bendavê.

Hilbijartin bi tenê nîşanderê azadî û dêmikrasiyê nîne, çimkî hekî wa ba, Beşar Esed û Pûtîn, dê qehremanê dêmokrasiyê bana, belkû hilbijartin vê demê wateya serrasta xwe heye ku azad û dadpewer be û mafê tak wek çavkaniya rewayîdan bi sîstemê bi fermî nas bike. Li rastiyê de hilbijartina azad û dadperwerane li fermînaskirina tevahiya wan tiştene bi dest ve tê ku dikarin bibêjin bi navê îtirafkirin bi kerameta mirov bêne binavkirin.

Li wir de ye ku hilbijartin dibe pêvajoyek bo nîşandana îradeya mirov û selimandina kerameta mirovî. Ger em bi wî çavî dêna xwe bidne hilbijartina azad û dadpewerane, em dibînin ku çîroka wilayeta feqîh û diyardeyek a bi navê hilbijartin, çêrokeke dehan salaneya binpêkirina kerameta mirovan li vê cografiyayê de ye.

Li mînaka herî nû, her li navxweyê moreyên destnîşankiriyên spaha pasdaran û yên heliyayî li nava wilayeta feqîh de, heta rehim bi yekê jî nekir û henekên xwe li wan kirin ku dengê nerizayetiya pasdarên xwe jî bilind kir!

Gera nû ya meclîsa hikûmî tevî baykotkirineke berfireh a neteweyên li Îranê de bi rêve ço û heta amarên destçêkiriyên rêjîmê jî da selimandin ku piraniya civakê li dijî wilyeta feqîh in û beşdarî nekirine û li dora duyê ya hilbijartinê de li hinek bajaran ku mabûn, heta kêmtir ji %8a xelkê beşdarî li vê şanoyê de kiribûn.

Li meclîsekae wiha de li 9ê Cozerdana 1403 a rojî de ku xwestin desteya serokatiyê bo meclîsê diyarî bikin, li nava nêzî 300 kesên beşdar de hejmara dengan ku hatine xwendinê û desteya serokatiyê hate diyarîkirin, pêka nûçeyên ku rêjîmê bi xwe belavkirine, endamên meclîsê nerizayetiya xwe dane xuya û daxwaz kiribûn ku dubare dengan bihejmêrin û hate dîtin ku hinek kes hebûn ku nêzîk bi nîveya dengên wan, nerast bû! û bi zêde bo wî nivîsandibûn!!!

Li yekem şanoya hilbijartinê ku rifrandoma direvîn a rêjîmê bû heta vê meclisa rêjîmê, ti demekê dengê serrast ên dengderan nehatiye xwendin û her tim destêverdan li dengan de hatiye kirin.

Li şêwazên destêverdan û dexeliyên dengan û rênedan bi xelkê bo xwe berbijêrkirinê û gefxwarin li xelkê bo beşdarî û herwisa dengdana bi zorê bo berbijêrên diyarîkirî û heta dehan şêwazên din ên destêwerdana hilbijartinê serrast, komara wilyeta feqîh, ceribandinên dehan sale hene û heta ew şêwazane bo welatên din û hinek cihên ku li wir bandor heye, şandine.

Piştî ku Reîsî û heyeta terorîstên hevkarên wî bûne rijî, komara îslamî dixwaze gereke nû ya şanoya hilbijartinê bo diyarîkirina dewsa Reîsî lidar bixe û hinek moreyan tîne û bazara hilbijartinê bi wan gerim dike û li dawiyê de jî moreyeke hewce bo vê serdema rêjîmê dê bêxe ber wîtrînê. Dexelîkirin û danîna mohreyan û piştre destêverdana hemû binyatên hilbijartina azad wek nerîteke hertimî cî bi cî dike û şanoyeke din lidar dixe. Ji hemûyan xirabtir ew e ku bo perdepoşkirina tawanên wan ji peyvên siyasî de çemkek nû çendîn sal in ku çêkirine û navê vê danane muhendisiya hilbijartinê.

Ev a ku bo vê kiryarên kirêt navê muhendisiyê li ser datînin, li rastiyê de dixwazin li warê xirabiya wateya destêverdana li dengên xelkê û tawanên wan kêm bikin û bi anîneberbasa peyva muhendisî, bi curek zîrekiyake ji şiyanê xwe de bidne xua û bi peyva endazyarî, rewatî bidne tawanên xwe. Neku li rastiyê de ewa ne tenê muhendisî nîne, belkû sivikatî bi kerameta morovan e.

Gendeliya aborî her wekî ku li destpêkê de hate îşarekirin, mifahvergirtina xirab ji berpirsayetiyê, ew xirabî hene ku hatine îşarepêkirin, lê destêverdana hilbijartina ji gendeliyê xirabtir e, çimkî hem mifahvergirtina xirab ji berpirsayetî û hem dengên mirovan jî bi bê nirx û bê biha dibîne û li rastiyê de hekî gendelî, timahiya li kîs û nanê ser sifreya xelkê ye, destêverdana hilbijartina jê standina nasnameya ji tak û binpêkirina kerameta mirovan e.

# Tijîkirina cihê “Serjêkerê Têhranê” û danîşandana rewabûna sîstemê



**N. Elî Munezemî**




Mirina Îbrahîm Reîsî, Serkomarê rejîma Îslamî a Îranê, li pey xwe re rewşek aloz û alingarîyên mezin bo rejîmê pêkanîn e û bala hemû aliyekê ji dostan û nayerên rejîmê kişandiye ser wan tiştên ku li Îranê de diqevimin.

Mirov dikare kartêkeriya nemana Reîsî li 3 qadên siyaseta derve, navxweyî û rikeberiya navbera aliyên rikeber di hundirê rejîmê de, wek 3 qadên giring, şirove bike û bide zelalkirin ku ew yeka dikare çi fersend û tehlûkeyan bo şoreşa azadîxwaziyê a neteweyên bindest û xelkê Îranê çê bike.

Karbidestên rejîmê heya niha zaf caran bas li wê yekê kirin e ku Serkomar di rejîmê de rola birêveber-eke lojîstîkî heye. Ewa tê wê wateyê ku Serkomar di rejîmê de cîbecîkarê siyaset û pîlanên rêberê wê rejîmê ye û bi xwe ew desthilata nîn e ku siyasetên rejîmê yên mezin (Makro) bi xwe pîlan bike.

Bes eger wisa be, rejîm pey birêvebereke lojîstîkî e ku bikare baştir li yên din di xizmeta pêşvebirina pîlan û bernameyên rêberê rejîmê de be. Reîsî yek ji wan bû ku her di destpêka xizmeta xwe bi rejîmê, karîbû îsbat bike ku bo rejîmê dikare her cinayetekê bike û her ew yeka jî bû sedem ku nasnavê « Serjêkerê Tehranê» bidin wî.

Reîsî ku destê wî bi xwîna azadîxwazan sor bibû û di serdema serkomariya wî de ku şoreşa «Jin, Jiyan; Azadî» serî hilda û gelek kes hatin kuştin û birîndarkirin, mirna wî bû sedem ku piştî demek dirêj, bo gaveke kurt be jî, xweşî û şayî bikeve nav dilê xelkê û tevî ku rejîmê Atmosfera tirs û xofê afirand û gef li xelkê kirin ku keyfxweşiya xwe nîşan nedin, lê xelkê bi kirîna şêraniya û awayên cuda neveşartin ku bi menama Reîsî dilxweş in. Lê xelk dizane ku ew dilxweşiya, dilxweşiyek demkî ye û heya rejîm hebe, xelk nikare dilxweşiyek domdar hebe.

Rejîma mirovkuj a Îranê di dema serkomariya Reîsî de eşkeretir û rasterast di qada siyaseta derve de jî rêka şer girte pêşiya xwe.

Ewan bi hajekbarana binkeyên hêzên Amerîka li Îraqê, hêriş bo ser sînorenên Belûçistan a bindestê Pakîstanê, hêriş bo ser Îsraîlê, hêriş bo ser binkeyên partiyên Rojhilatê kurdistanê li Başûrê kurdistanê û hajekbarana keştiyan di deryaya Sor li rêka taşeronên xwe û … da eyankirin ku eger rejîm bikeve tengasiyê, dikare dest bo her cinayetekê dirêj bike.

Hemû aliyek niha baş dizanin ku ew yeka ne siyaseta Reîsî bû. Ew yeka pîlan û siyasetên rejîmê û bixasma rêberê rejîmê bû û nemana Reîsî ew rêbaza bi tehlûke naguherî.




Di hundirê rejîmê de jî her li destpêkê ve heya niha du rêbazên dijber lê di xizmeta pêşveçûn û bihêzbûna rejîmê de bihevra di kêberkê û rikeberiyê de ne. Ew her du rêbaz bo parastina rejîmê û desthilatdariya wê tiştek ferqa wan nîn e. Lê yek dixwaze bi pembo serê xelkê jêveke û yek jî bi kêrikê.

Bi wê wateyê ku di ser usûl û pirensîpan wek yek in û di pratîkê de hindek ferqa wan heye. Reîsî û nûnerê taqima binajo a rejîmê bû, niha di nemana wî de rêberê rejîmê û taqima binajo ketine tengasiyê. Lê tê gotin ku îmkan heye Reîsî li ber rikeberî bo ku bibe rêberê rejîmê piştî nemana Elî Xamineyî, ewan bi xwe kuştina wî pîlan kiribe.

Lê di kurdî de dibêjin ku «mêrik hate kuştin, çi siwar be yan peya»! Niha di nemana wî de rejîm dibe hilbijartina pêşvext bo serkomar bike û «birêvebereke lojîstîkî» ê nû destnîşan bike. Ewa ku hemû dizanin û heya niha jî her berdevam e ewaye ku di sîstemeke totalîter de, hilbijartin tenê şanoyek komîk e ku ne sîstemê baverî pê heye û ne jî xelkê.

Bo hemû aliyekê zelal bûye hilbijartina nûnerên parlemana rejîmê di heyamek kurt beriya niha belgeye bo wê rastiyê ku dûrahiya navbera xelkê û rejîmê hind zêde bûye ku taze nayê tijîkirin.

Lê ewa ku roja yekê ya navnivîsa berbijêran bo wê şanoya komîk derdikeve, ewaye ku şanovanên rejîmê jî bêkar nerûniştin e û dixwazin bi şanoyek nû armanca xwe bi cih bînin û bo rewayîdan bi rejîma xwe, xelkê bikşînin ser sindûqan.

Ew dixwazin hindek mohreyên xwe bi rolek nû bînin meydanê û ji aliyek din jî dixwazin hindek endamên wan partiyên ser bi rejîmê di bin navê partiyên siyasî bînin meydanê ku sîmayek demokratîk bidin wê hilbiartinê û piştre jî bi şêveyek efsûnî ku bi xwe tê de hosta ne, mohreyek xwe li sindûqan derêxin.

Lê ew xelkê ku îradeya xwe di şoreşa «Jin, Jiyan, Azadî» de nîşan da gelo yê pê wan lîstokan were xapandin!? Ew yeka gelek ber bi aqil nîn e û xelk yê wê carê zêdetir li her demekê rejîmê rezîl û riswa bike. Xelkê re wê carê fersendek nû hatiye pêş ku hemû rewabûna wê rejîmê lê damale û wê yekê bike ders û waneyek nû bo hemû sîstemên cinayetkar.

# Çavên ku bo ”Refeh”ê digirîn, derheq Kurdistanê kor in



N. Serbest Urmiye




Pitir ji nîv salê ye ku gerra nû ya şer di navbera Îsraîl û taqimên şerxwaz ên Felestînê yên girêdayî bi ”Hemas”ve ku rejîma Îslamî ya Îranê piştevaniyê ji wan dike, didome.
Şerê ku piştî êrîşa bi navê “Bahoza El Eqsa” ya ku di roja 7’ê Oktobera 2023’an a Zayînî de ji aliyê taqima “Ezedîn Qesam” a girêdayî bi rejîma Îrane ve bo ser xelkê sivîl yê Îsraîlê destpêkir.

Di heyamê ku şer li herêma ”Xeze” a Felestînê de berdewam bû, ji bo ku xelkê sivîl li zirarên zêde yên şer were parastin, artêşa Îsraîlê daxwaz ji xelkê sivîl kir ku li herêma bi ewle ya ”El Mewasî”, akincî bin.

Her weha hejmareke zêdê jî ji xelkê sivîl li herêma ”Refeh”ê akincî bûn, lê li gor ragihandinên berpirsên siyasî û leşkirî yên Îsraîlê, taqima ”Hemas” ji herêma navbirî bo êrîşên mûşekî bo ser Îsraîlê mifah wergirtiye û ev yek jî bû hêcetek û Îsraîl êrîşeke berfireh destpêbike bo ser herêma ”Refeh”.

Li gor amarên fermî, piştî êrîşa han ku tê gotin bi merema derbe lêdanê li taqima ”Hemas”ê û kuştina hin berpisriyarên şerxwaz yên vê taqimê di herêma navbirî de bûye, 45 kes ji xelkê sivîl hatine kuştin.

Kuştina xelkê sivîl ji bilî navendên siyasî û biriyardanê yên cîhanî, yê bûye sedema dengvedenên cuda di nava kom û takên civakê de jî.

Hevdem ku dewleta Efrîqa ya Başûr, Îsraîl di Dîwana Bilind a Dadweriya Cîhanî ya ”Lahe” de bi komkujiyê sûçdar kir û biryara sekinandina şer û derketina leşkirên Îsraîlê li herêma ”Refeh” ê li dîwana han wergirt, gellek serok û berpirsên dewletên cuda jî êrîşa han şermezar kirin.
Di pêngaveke nû de welatên weke Norwêj, Îspaniya û Komara Îrlend’ê, Felestîn weke dewleteke serbixwe dane zanîn.

Ji bilî helwestên siyasî, di torên civakî de jî silogana ” All Eyes On Rafah” wate hemû çav ji “Refeh”ê dinihêrin, bi terzeke berbilav ji aliyê çalakvanên sivîl û bikarhînerên torên civakî de hate weşandin ku tê de hejmareke zêde bikarhînerên Kurd ên jî dihatin dîtin.

( Helbet silogana han nemaze di nava bikarhînerên Îran û Rojhilatê Kurdistanê de dengvedaneke dijber û berevajî jî hebû ku bi navê Kurdistan, Efrîn û Îranê, dijberiya xwe bi silogana han re eşkere kirin).

Ya ku ji hemûyê pitir bala mirov dikeşîne, hevterîb bûna helwesta cihanî derheq şerê li ser ”Refeh”ê ye, tevî helwesta rejîmên Îran û Turkiyê. Rejîmên ku rondikê mekr û fêlan bo Felestînê dirêjin û ji her derfetekê mifahê werdigirin ku şerê li dijî taqimên şerxwaz li Felestînê yên ku hertim gefê ji ewlehî û tenahiya herêm û cîhanê dikin, weke şerê li dijî mirovahiyê û komkujiyê bidin nasandin, li hember çavên cîhanê di dîroka xwe ya hevçerix de, bi dehan komkujî û tirajidiyan li dijî mirovahiyê di asta cîhanî û bi taybetî di Kurdsitanê de tomar kirine û nahên baskirin.

Dewleta Turkiyê di heman demê de ku li komkujiya Kurdan li Bakûrê Kurdistanê û herêma Efrînê li Rojavayê Kurdistanê berdewam e, ji bilî komkujiya Ermeniyan ku heta qasekê bi fermî di cîhanê de hatiye nasandin, li Kurdistanê destê xwe ji çi derfetekê bo komkujiya Kurdan neparastiye û ji bilî komkujiyên Dêrsimê û Geliyê Zîlan, êrîşa bi top û tangan û wêrankirina taxên cuda yên Amedê, komkujiya kasibkarên Roboskiyê û .... jî di dîroka xwe ya nû de tomar kirine.

Li Îranê jî di demekê de ku em ber roja 12’ ê Cozerdanê salvegera li sêdaredana 59 ciwanên bajarê Mehabadê(sala 1362’an ya Rojî) bi destê rejîma Îslamî ya Îranê ve diçon, ji bilî komkujiya bajarên Sine, Kirmaşan, Nexede, gundên Heleqoş, Gêçê, Pîrancix, Qarnê, Qelatan, Çeqel Mistefa, Xelîfelyan, Gorxane , Cibraîlawa û Gundewêlle û ... kuştina bi hezaran giriyên siyasî yên Hawîna sala 1367’an a Rojî, li her bihustekê ji axa Rojhelatê Kurdistanê, Belûçistanê, Xozistanê û ... de tirajidiyek li dijî mirovahiyê di karnameya rejîmê de hatiye tomarkitin û destê vê di hejmareke zêde li komkujiyan di asta herêm û cîhanê bi taybetî di Îraq û Sûriyê de, nehatiye veşartin.

Ya herî berçav ku heya niha jî civaka cîhanî weke hewce bala xwe nedayîyê de, komkujiya xelkê nerazî yê şoreşa ”Jîna”yê, ye ku rejîm heya îro jî di terzên cuda de berdewam e li kuştina ciwanên Kurdistanê û tepeserkirina şoreşê. Ji bilî tepeserkirina azadîxwazan, li gor hejmarên ku heya niha hatine ragihandin tenê di 2 mehên borî yên sala nû de 17 kolber di pêxema peydakirina nan û jiyanê de bi guleyên rejîmê hatine kuştin, helbet Kurdên ku hatine lisêdaredan jî hejmareke cuda tomar kirine.

Eva rast e ku kuştina mirovan di her ast û qewareyekê de mehkûm e û pêdiviyê berengariyeke cidî û cîhanî ye, lê niha banga me ji civaka cîhanî û rêkxistin û çalakvanên sivîl eva ye, gelo bila we dîrok ji bîra xwe biribe, lê di bûyerên nû de, dema ku tangên dewleta Turk li Efrînê û tangên ”Heşd a Şeibî” li Kerkûkê bi alîkariya rejîma Îranê bi ser laşê şervan û Pêşmergeyên azadîxwaz ê Kurd di pêxema avakirna dewletê de derbas dibûn, çavên we Kurdistan didîtin?

Gelo we laşê Mihemed ê şewitî bi çekên qedexe kirî yên Turkiyê di şeqamên Efrînê de nedît, yan çavên we li Amedê nebûn ku tûrikê hestiyên xortê Kurd li ser destê babê wî bibînin.

Dema ku di Şoreşa”Jîna”yê de , şeqam û kolanên bajarên Rojhilatê Kurdistanê di pêxema jiyaneke azad de bêhna xwîn û barûtê girtibûn, we ji kur mêze dikir? Bi xasmanî banga me li çalakvanên Kurd e ku di vê derheqê de, ma gelo hûn bi dengê bangê sibê jî hişiyar nabin ku termên Kuştî yê kolberan û li darvekiriyan li ber girtîxaneyên rejîma Îranê bibînin?

# Dema wêye em bên bihîstin!



N. Dr. Mecid Heqî

Piştî rojekê ji êrişên diron û mûşekî yên Îranê bo ser Îsraîlê, David Cameron Wezîrê Derve yê Brîtanya piştî serdana xwe ya Îsraîlê ragihand ku êdî hemû cîhan naveroka rejîma Îranê dizane û dizane ku ew rejîme êrîşkar û metirsîdar e. Bi salan beriya êrîşa Îranê ya li ser Îsraîlê di 13ê Nîsana 2024 de, Îranê bi rêya terorîzma dewletê, êrîşên li ser kampên penaberên Rojhilatî, navendên partiyên kurdî û carcaran êrîşên li ser berjewendiyên Amerîkayê yên li hundirê Iraqê û başûra Kurdistanê, ceribandibû. Lê ti êrîşên ku bûne sedema kuştin û birîndarbûna bi dehan çalakvanên Rojhilat û hejmarek ji xelkê Başûrê Kurdistanê ji aliyê civaka navdewletî ve bi cidî nehatin girtin.

Metirsiya Îranê ya li ser aştiya cîhanê di roja ku Ayetullah Xumeynî di 19ê Tebaxa 1979 de li dijî gelê Kurd cîhad ragihandibû, eşkere bû. Rejîma Îranê di cih de nîşan da ku ew bi ti awayî bi navê peymanên navneteweyî û danezanên mafên mirovan ên ku dewleta Îranê îmzekarê wan e, nas nake. Yan jî dagîrkirina balyozxaneya Amerîka li Tehranê di 4'ê Mijdara 1979'an de û piştî wê jî êrîşên ser balyozxaneyên Brîtanya û Erebistana Swîdê nîşan da ku ev rejîm rêzê li tu prensîb, yasa û qanûnên navneteweyî nagire.

Di heyama 45 salên derbasbûyî de, ji bilî apartheidê sîstematîk li dijî neteweya Kurd, torên terorîstî yên Îranê li her derê ji destên wan tê, xwe ji tawanên dijî mirovatiyê neparastine. Bi sedan ji çalakvanên Kurd û endamên hêzên opozisyona rejîmê ji aliyê terorîstên Îranê ve hatine kuştin û birîndarkirin. Ji wan ya herî berçav terora serokên kurdan e Dr. Qasimlo di 1989 û Dr. Şerefkendî li sala 1992 de.

Êrîşa 13ê Nîsanê ya li dijî Îsraîlê rastiyek veşartî ji cîhanê re eşkere kir. Di Nîsana 2022an de, du meh piştî êrîşa Rûsyayê bo ser Ukraynê, serkirdeyên NATOyê dewleta Rûsyayê wek metirsiyeke rasterast li ser demokrasî û aştiya cîhanê û hikûmeta Çînê jî wek metirsiyeke cidî ji bo pêşerojê binav kirin. Çîn piştî Amerîkayê duyemîn aboriya herî mezin a cîhanê ye û bi welatên rojava û bi taybetî Yekîtiya Ewropayê re têkiliyên aborî yên xurt hene. Ji ber ku Çîn û Amerîka di mijara Taywanê de li hev nakin û hevrikî di warên teknolojiya leşkerî û aborî de diyar e. Xetereya Çînê ya li ser Taywanê û pabendbûna Amerîka ya ji bo parastina wî welatî "şabahî" ya Şerê Cîhanê yê Sêyem e. Lê niha em dikarin bêjin Komara Îslamî ya Îranê ye ku dema bixwaze dikare cîhanê li Rojhilata Navîn ber bi wêraniyê ve bibe.

Divê cîhan îro fêhm bike ku her çend Çîn ji bo berjewendîyên rojavayî xetereyek cidî ye, lê Çîn jî bi vê yekê dizane ku ger pirsgirêkên wê bi cîhanê re kûr bibin, dê yekem zirarê bibîne. Piştî ku Çîn di Kanûna 2001ê de bû endamê Rêxistina Bazirganiya Cîhanî, bi sed milyonan xelkê Çînê ji sînorê hejariyê hatin derxistin û aborî û jiyana wan baştir bû. Çîn embara hemû kelûpelên cîhanê îro ye. Ji ber vê yekê ji aliyê aborî ve jî Rojava û Çîn nikarin pirsgirêkên xwe zêde kûr bikin. Ji bo Partiya Komunîst a Çînê, heta ku gelê wê guh nede siyaset û rexnekirina dewletê, refaha gel pir girîng e û naxwaze hêza xwe ya aborî bike qurbana îdeolojiya siyasî, Lê Îran!

Îran xwediyê %9ê çavkaniyên binerd ên cîhanê ye û nifûsa wê jî nêzîkî %1ê cîhanê ye. Li gorî sindoqa navneteweyî ya dirav, aboriya Îranê kêmtir ji %0,5 aboriya cîhanê ye. Li gorî vê yekê Komara Îslamî ya Îranê tiştekî ku winda bike nîne. Niha ji bo hemû cîhanê eşkere bûye ku dorpêçên aborî û siyasî jî derfetek e bo Komara Îslamî ya Îranê ku siyasetên xwe yên qeyransaz û gefxwarinê li navçeyê pêş bixe û bibe sedema pirsgirêk û serêşiyên zêdetir li cîhanê. Welatekî ku %9ê jêderên aborî yên cîhanê hebe, sermayeya wê heye ku bi rêya proksî û piştevaniya hêzên terorîst bibe metirsî li ser tevahiya cîhanê. Komara Islamî ya Îranê bi mebesta muzakirên navokî û bi hincetên ne mumkin muzakirên xwe yên navokî rawestandîye, da ku melayên desthilatdar bikarin meyandina oranyumê zêde bikin heta asta berhemanîna çekên navokî.




Bi wê rêyêde ji aliyekê ve dikarin îdia bikin ku Îran ne welatekî navokî ye û hîn jî pabendî Lihevkirina Navokî ye û ji aliyê din ve jî dest danîne ser pilapîtka ku cîhanê tehdît bike.

Di serdema me de hindik welat bi qasî Komara Îslamî ya Îranê gefê li aştiya cîhanê dikin. Piraniya welatên hevrikên cîhanê di pêşbaziya xwe ya herêmî û navneteweyî de herî kêm normên hiqûqa navneteweyî dişopînin. Di vê navberê de Îran rûyê tarî yê hemû hikûmetên cîhanê ye û ne tenê ji bo neteweyên Îranê metirsî ye, belkî rasterast û nerasterast gefê li hemû welatên cîhanê dike. Îrana di bin desthilata rêjîma Komara Îslamî de, gefeke rasterast e bo ser hemû cîranên xwe û eger rojekê bikaribe bi mûşekên xwe yên dûravêj dilê Ewropa û Amerîkayê bike armanc.

Siyaseta rûbirûbûna Rojava heta niha tenê bi sepandina dorpêçên aborî li ser Komara Îslamî bûye, lê belê cezayên rojavayî Komara Îslamî negirt. Lê cezayên Rojava heta niha ti bandorek li ser rejîma Îranê nekiriye û rejîma Îslamî jî dest ji gefxwarina cîhanê bernedaye. Rejîma Îranê û sipaha Pasdaran tevî dewletên din ên otorîter fêr bûne ku dorpêçan wek derfetekê bikar bînin ji bo sûdwergirtina ji qeyrana navdewletî. Ew fêr bûne hem dorpêçan derbaz bikin hem jî şiyanên xwe yên çekdarî û leşkerî dûrî çavdêriya navneteweyî pêş bixe û hêza xwe ya masûlkeyê ji bo zordestiya navxweyî û gefên li ser cîhanê pêş bixe. Kêmasiyeke din jî ew e ku Rojava potansiyela netewên bindest ên Îranê ji bîr kiriye. Ji bo civaka navdewletî ya bindest ji aliyê rejîma Îranê ve, netewên bindest ên Îranê baştirîn derfete û ez dikarim bibêjim ku tenê ew hêz in ku rejîma Îranê ji bihêzbûna wan ditirse û nîgeran e. Diviy Amerîka û Rojava heya niha pê bihesiyana ku piştevaniya siyasî ji têkoşîna netewên bindest ên Îranê, Îranê neçar dike ku li qada navneteweyî reftarên xwe biguherîne.

Rewşa piştî êrîşa 13ê Nîsana 2024 derfeteke nû ji bo hêzên siyasî yên Kurdistanê û neteweyên bindest ên Îranê çêkiriye. Pirrengiya netewî ya Îranê bûye sedema wê yekê ku tu hêz û rêkxistinên navendgera li Iranê de neyê ava kirin. Ew hêzên ku xwe bi "navendgera" didin nasandin, bi gor min tenê hêzên santiralîst in ku bi siyaseta xwe derfetê didin komara Islamî.

Niha ku naveroka êrîşker a Komara Îslamî ya Îranê ji bo civaka cîhanî bi taybetî welatên pêşketî yên cîhanê hatiye zanîn, divê kûrahiya têkoşîna dîplomatîk û navneteweyî ya netewên bindest bi taybetî neteweya Kurd kûrtir bibe. Dem hatiye ku mijara binpêkirina mafên mirovan ji aliyê hêzên siyasî yên dijberê rejîma Îranê, mijara apartheid a sîstematîk a neteweyan, gefên hevpar ên Îranê li dijî netewên bindest û cîhanê were bilindkirin û balkişandina ser potansiyela têkoşîna netewî ji bo berjewendiyên hevpar.

Tenê bi şopandina rêbazên berê yên dîplomasiyê û têkiliyan em nikarin pirsgirêka xwe ya neteweyî bînin rojevê û piştgiriya cîhanê bikşînin. Niha dem hatiye ku nirx, slogan û berjewendiyên hevpar di çarçoveya stratejiyeke netewî û dîplomasiya netewî de cihê dîplomasiya perçebûyî û kurtbîn were formulekirin. Bi vî awayî dinya dengê me bibihîze û em li marjînal ve bibin faktora diyarker!

## Nerîna




**“Nêçîrvan Barzanî”:**

**“Ji bo Kurdistaneke bihêz pêwîstî bi nifşekî têr zanîn heye”**



**“Antony Blinken”:**

**“Divê Hamas peymana ji bo bidawîkirina şerê Gazzeyê bê dereng qebûl bike”**




**“Rafael Grossi” :**

**“ Komara Îslamî ûranyumê di asteke gelek bilind de dewlemend dike û ev jî cihê nîgeraniyê ye”**



**“Dongjun”:**

**“Faktorên derve perspektîfa pêvekirina aştiyane ya Taywanê ya bi Çînê re xirab dike”**

# Şoreşa Jînayê morala jinan bilind dike û xwekujî kêm dibe!



**N. Eskender Ceiferî**



Keçeke evîndar, jineke azadîxwaz û jineke mafxwaz qet nikare li Kurdistanê di bin siya rêjîma faşîstên Tehranê de ku Îslamî ye, bibe xwedî maf. Dema ku serhildana Jînayê di germe germa xwe de bû, hejmara xwekujiyan jî li Rojhilatê Kurdistanê kêm bibû.

Di heyamên derbasbûyî de dîsa li Kurdistanê çendîn keç û jinan dawî li jiyana xwe anîn. Çend mînakên ji bajarên wek Ormiye û Sine, nimûneyên xembar ên vê diyardeyê bûn.

Lêkolînên çalakvanan didin xuyakirin, her dema ku hêviya xelkê bi neman û têkçûna vê rêjîmê zêdetir dibe, ew hest bi aramiyê dikin û di encamê de hejmara bûyerên xwekujiyê jî dadikeve.

Li gor ku çalakvanên sivîl didin zanîn, rêjeya salane ya xwekujiyê li wir ne kêmtirî rêjeya salane ya darvekirinê ye. Piraniya wan kesên ku xwe dikujin jî, jin in.

Xwekujî, kiryarek e ku mirov bixwe tê de biryarê dide dawiyê li jiyana xwe bîne. Mirov dikare bêje sedema sereke ya vê kiryarê li hemû civakan bêhêvîbûn e. Xwekuj, ji her çandekê bi her zimanekî û ji her neteweyekê be, digihe astekê ku li gor wî wê neman jê re bi mifahtir e ji jiyanê.

Li gorî zanyariyên çalakvanên Kurd, piraniya wan xwekujiyan ji ber sedemên weke namûs, abûrî, tûşbûna bi madeyên hişber û ji ber pirsgirêkên malbatê ye.

Eger kerameta mirovan ji hikûmetan re girîngtir be, divê kesekî sivîl nekare bi hêsanî çek û sîlahan bi dest bixîne. Hebûna çek û sîlahan di civakekê de dikare fikra tundrew li pey xwe ve bîne. Eger salane 200 welatiyên Kurd ji aliyê wezareta Dadê ya rêjîmê ve tenê darvekirin, zêdetirî 500 kesan jî dawiyê li jiyana xwe tînin.

Hebûna hebên naskirî bi Birinc û Siyanor jî dikare rê li ber xwekujiyê veke. Ew kîjan dermangeh e ku li Îranê, bêy biryara pizîşkan, heban nefuroşe! Salane 800 hezar kes heya milyonek kesan li hemû cîhanê bi şêwazên curbicur dawiyê li jiyana xwe tînin.

Rêkar û rênimûniyên olî, dema ku tevlî siyasetê dibin, fikra mirovan jî diguherin. Li gor ola Îbrahîm, jiyan tiştek pîroz e lê xwekujî jî gelek ciyê gazindeyê nîn e.

Japonî jî xwekujiyê weke qerebûya pêşîneya xirab dibînin. Li Hindistanê jî jina ku zilamê wê dimir, dikarî xwe bavêje ser agirê ku laşê zilam pê dişewtînin da ku ew jî dawiyê li jiyana xwe bîne.

Li gelek ji welatên Rojava, êdî xwekujî yan hewla xwekujiyê weke tawan nayê hejmarkirin. Lê belê divê ji bîr nekin ku hêviyên jiyana xelkê li welatên Rojava eger gelek jî baş nebe, lê hêjayî kerameta mirovan e.

Li hin welatan şêwazeke xwekujiyê bi navê Xwekujiya Alîkar heye. Hin çalakvan dibêjin hikûmeta Îranê jî bi kiryarên xwe ên abûrî û siyasî bûye alîkariya xwekujya qurbaniyan dike.

Hin siyasiyên Îranê pêşniyar dikin ku termê wan kesên ku xwekujiyê dikin, di qebristanên gund û bajaran de neyên binaxkirin. Lê belê wan ji bîr kiriye ku divê çavkaniya xwekujiyê bê hişkkirin.

Mentiqa wan kesan Atêna berê ya Yonanê ye ku kesên bêy erêkirina hikûmetê dawiyê li jiyana xwe tînin, ji binaxkirina di goristanan de dihatin bêparkirin û bê navûnîşan li dervey goristanan dihatin binaxkirin.

Dibe ku ew kiryar jî bikarin meyl û heza xelkê ji bo xwekujiyê kêm bikin. Lê dîsa jî nabe hikûmet ewqasî xemsar be ku li dewsa zuhakirina çavkaniyê, qurbaniyan weke tawanbar bide nasandin yan jî piştî xwekujiyê, hikûmet dest danî ser milk û malên wî.

Desthilata ku herî zêde bi şêweyek radîkal li hemberî vê mijarê derdiket, Birîtanya di sedsalên 19’an de bû. Eger li ser kesekî bihata îsbatkirin ku hewla xwekujiyê daye, ew kes dihate darvekirin.
Mentiqa desthilatdarên wê demê ên Birîtanya ji bo îdamkirina kesên ku dest davêjin xwekujiyê ew bû ku tirsek li cem xelkê çê be û li encama xwekujiyê bifikirin.

Ji xeynî sedemên han, hin bûyerên din jî çê dibin. Çendîn caran heta niha li Kurdistana Îranê bûyerên bi vî rengî derketine ku keçek ji aliyê saziyên ewlehî ve tê girtin.

Tê gotin ku hêzên navbirî di girtîgehan de destdirêjiyê dikin ser wan keçan ku bi sedemên siyasî hatine girtin. Ji ber vê jî, hin keçên Kurd piştî ku serbest têne berdan, dawiyê li jiyana xwe tînin da ku navekî xirab nekeve ser wan.

Hin siyasiyên nêzîkî Mihemedê Xatemî li Îranê behsa yasayîkirina xwekujiyê kiribûn. Lê berî ku bibe mijara ragihandinê, hate bêdengkirin. Li gor wan kesan, diviyabû kesên ku dixwazin dawiyê li jiyana xwe bînin, sedemên baş ji bo vê biryarê bînin û endamên laşê xwe jî pêşkêş bikin.

Tevî hemû van basan jî, heke şoreşa Jînayê serkeve, wê demê dê asta xwekijiyê di civakê de bigihe asteke herî kêm û dibe ku ji holê rabe.

# Werin em metirsiya li ser têkoşîna jina Kurd hîs bikin



**N. Mujgan Elîpûr**
**W. Hesen Mukerem**



Jina Kurd ev nêzî sed salî ye ku ji bo maf û azadiyên xwe têdikoşinê dike û di vê rêyê de gelek hilbûn û daketin çêbûn û bûn sedem ku têkoşîna ji bo mafên zayendî bê paşxistin û gelek caran jî bûne qurbaniya rewşên siyasî û bo heyamek zêde dengê wê nemaye..

Yek ji sedemên sereke hebûna desthilatdarên dîktator û zêdexwaz bûne di dîroka Îranê de bandorek mezin danîne û îtraf bi hebûna mafê gelê vê erdingariyê nekirine û her ev yeka jî bûye sedem ku jina Kurd neçar bibe rêya xebata neteweyî û nasnameparêzî bigire berahîka xwe û hevdem digel xebata wekheviyê ber bi pêşve bibe.

Ger em li Komara Kurdistanê û damezrandina rêkxistina yêkîtiya Jina Demokrat a Kurdistanê wek qonaxa fermî ya têkoşîna jinan binêrin heta Serhildana Jînayê û Şoreşa Jin, Jiyan, Azadî, emê bibînin ku jinên Kurd bi çi lehengî qonaxên dijwar derbas kirin û gelek destkevt jî hebûye û gihîştiye kupika xwe.

Lê pirs ev e, piştî derbasbûna nêzîkî sed salî ji têkoşîna jinan di Hizb û rêxistinên cuda de, çima nekarîn bibin dengekî xurt li Îranê û li derveyî welat?

Nebûna pêkhateyeke serbixwe astenga herî mezin e li ber van nediyarbûn û bandoran, lê di kêlega vê de jî gelek faktor hene ku bi li berçavgirtina wan, rewşê gelek diguherînin.

Parvekirina enerjiya jina Kurd li ser partî û rêxistinên cuda bûye sedem ku dengê jinên Kurd navber be û negihîje aliyên pêywendîdar, lê ji vê girîngitir jî ku zirar gihandiye, yekgirtînebûna van alî û rêxistinên Kuran yên ku ji bo pirsa jinê têkoşîn dikin ku nekarîne yêkgirtî van astengî û derdên jina Kurd bigihînin bi cîhana dervey xwe û ev hewlên ku dane bandorek wisa tunebûne.

Di şoreşa Jin, Jiyan, Azadî de jî ev kêmasî di xebatên rêxistinên jinan de diyar bû, tevî ku têkoşîna jinên Kurd li hundirê Rojhilatê Kurdistanê di warên cuda de di asta herî bilind de ye û berxwedana wan a li dijî dîktator û berdewamiya wan jî cihê lêhînbûnê ye. .

Ji ber vê yekê jinên Kurd bi vê têkoşîna dûr û direj nekarîn weke jineke navendî derkevin pêş û bala cîhana derdor bikişîne Mînaka vê îdiaya şênber jî Şorş Jînayê bû, ku jinên Kurd pêşengaiyetî kir û di cîhana navnetweî de wek jina Îranî behsa lehengiya jinan hat kirin û ti behsa jina Kurd nebû û heta di manhorên dîplomasî de pr bi başî mifah ji vê mijarê vergirtin û xwestekên şoreşê ji derve ji rê derxistin.

Li gorî van rastiyan divê jinên Kurd û hemû rêxistinên jinan û jinên di nava partiyên siyasî de vana weke metirsiyekê li ser têkoşîna jina Kurd bibînin û di vî warî de zêdetir xwe berpirsyar bibînin û di rastî de ev erka jî dikeve li ser milê tevahiya jinan çi li hundirî welat û çi li dervey welat.

Hundirê Rojhilatê Kurdistanê ku navenda têkoşîna me ye, di warê xebat û tekoşîna jinan de gelek dewlemend e. Hişyariya jina wisa kiriye ku ji hemû jinên Îranê cudatir bin.


Lê ev hewl û têkoşîna rêxistinan nekirine û bihevre girê nedane û her ji ber vê ye ku dibe xema jina Kurd di çarçoveya Îranê de yekdestkirina têkoşîn û çalakiyan be û bazineya van têkoşînan mezintir û kanalîzetir bikin heta ku guftmanek zelal li xebata jina Kurd li Îranê û bi taybet li Rojhilat bê temsîlkirin.

Helbet ger ev tiştên ku li serve hatine diyarkirin bên kirin, pêwîst e ku derbasî cîhaneke berfireh a ku jina Kurd û dîroka wê weke xwe nîşan bide, were veguhestin.
Em bi bîr bînin ku hemû dîrok û qurbaniyên jinan di berdewamiyê de ne û pêşxistina vê têkoşînê de ye. Em di serdemek hestiyar de ne, ji aliyekê hikûmeta dijî gelê Kurd û ji aliyek din fimînîstên berçavteng yên navendê di hewla matkirina van hewlan de ne.

Ji ber vê yekê divê em bi israra li ser nasname û dîroka xwe ji her îhtîmalekê re amade bin û hewl bidin ku şopa tiliya jinên Kurd di guhertinan de xuya bibe.



# XELK JI XWE RE XEYALÊN MEZIN DIKIN Û JIBO PÊKANÎNA WÎ JÎ XEBAT DIKE



N. Hasan Harrani

**Beşa 1**

Di vê nivîsê de ezê çend xalên sereke bigirim dest û xalekî jî bi taybetî ezê derêxime pêş. Ew xal jî ewe ku Kurd hezar sale nebûne xwedîyê wî ku ew xal aqilê dewletîyê ye.

Serîhildana Şêx Seîd, Seyîd Riza û ya dawî a Agirîyê em bidin alîyekî, li Bakurê Kurdistanê 45 salên dawî di dîroka vê beşa Kurdistanê de serîhildana dawîye û ya herî demdirêje.

Ez bixwe jî him bixwe di nav de him jî şahidê 35 salên vî 45 salî me.
Dîroka herî girîng jî ji xwe van 35 salên dawîne. Du salên zilmata zîndanan em nakin nava wan 35 salan. Lewre ew du sal taybete û cihê wî cudaye.

Ew sal salên Mazlûm, Xeyrî, Ferhat û Necmetîn Buyukkaya ne. Cihê van lehengên Kurd di dilê hemî Kurdan de xwedî cihekî zêrîne. Gotinekî ti Kurdekî a xerab jibo van lehengan û jibo xebata wan nîne û nabe.

Berxwedana ku 35 sal berê li derve dest pê kir û pêşket li ser wê şîyar û xeyalên wan pakrewanan rabû. Her gotina ku li ser nav û deng û berxwedana wan lehengan hat gotin, her çalakîya hat kirin û her pêngavên hatin avêtin bû serkevtinek xurt û encamên mezin derkete pêş.

Di şer de keç û lawên Kurd lehengin, qehrêman in. Kêmasî û qisûr di wan de nîne. Qisûr û kêmasî di me Kurdan de hişmendî û nezanîna sîyasetê û zû xapînîya bi dijminê xwe ye.

Mînakên vê yekê di dîroka serîhildanên Kurdan de bi dehan hene. Herkes vê qusûr û kêmasîyê dizane û dibêje lê heya niha bi gorî dîtin û encamên li holê xuyaye me ti ders û encamek jê hilnedaye. Bi raya min karesata herî mezin zîhnîyet, erbabî û feraseta rêbertîyê ye. Krîz û xetimandinên tekoşînên Kurdan di hemî rabûnên wan de di encamê de vê xisûsîyeta krîza alozîya rêbertîyê mora xwe lêxistîye.

Ji Silheddînê Eyyûbî virde mixabin rêberên ku di sîyaset û muzakireyê de nehatine xapandin û winda nekirina hema bêjin nîne.

Başe, gelo çîye sedemên vê windakirina di sîyaset û muzakirêyê de?
Ez di vê mijarê de sedema herî sereke ku dibînim, nebûna aqlê dewletîyê ku ev hezar sale di nava Kurdan de bi destê Kurdan nehatîye îcrakirine.

Tiştekî ger civak demekî dirêj neke di nava demê de jê bîyan dibe, wî û kabilîyeta xwe winda dike.

Bi raya min Kurdan jî dema ku aqlê xwe yê dewletîyê berdan an jî winda kirin û şûnde qabilîyet û feraseta rêbertî û rêvebirbûna komelgehîya civakî jî winda kir. Bîyanbûn û dûrketina ji aqilê dewletbûnê bû sedema gelek kêmasî û windakirinên giring di jîyan û pêşketina me Kurdan de.

**Mixabin û sed hezar car mixabin ev du sedsale di nava Kurdan de rêberên ku ji nava Kurdan derketin jî nebûn xwedî hişmendî û ev aqilê dewletbûnê. Em behsa duristbûn û fedakarîya rêberên xwe nakin. Di vî warî de kêmasî nîne. Lê feraseta û têgihiştina aqilê dewletbûnê tiştekî cudaye.**

Têgihiştina ji alîyê hiqûqî, felsefî, edalet, wîjdan û rêveberîyê de ji hemî exlaq, hiqûq, wîjdan û feraseta nav civakî cudaye.

Lewre civak ti caran ev xisletên me rêz kir yên civakê li dijî xwe naxebite, lê ev tiştên me got li gorî demê, mercan û rewşê dema hewce dike li dijî van nîrxên xwe jî dixebite.




Yanî dema îcab dike wîjdan nake, exlaqê medenî guhdar nake û hiqûqa xwe dide alîyekê. Lê di hiqûq, pîvan û normên civakê de dûrketina ji vana çênabe.

Ferqa normên civakê û xebitîna aqilê dewletê ji hev ev e.

Wekî me li jor jî anî ziman windakirina aqlê dewletîyê bi xwe re tiştekî din yê girîng da windakirin. Ew jî zanîn û kodên civak û dewletbûnê bûn.

**Kurdan têkilîyên civakê û girêdana wî bi organîzasyona dewletbûnê ve yên komplike jibîrkirin. Jixwe di dîrokê de ti caran nebûn xwedî kod û formên dewletbûna modern.**

Di zemanên ku dewlet avakirin û birêvebirinê de jî sazîmanî avasazîya dewletên wê demê li ber dewletbûna vê demê wekî organîzasyonekî eşîrtî dimîne.

Kurdan li rojhelata navîn di destpêka mirovahîyê cara yekem forma civakî ya li ser esasê organîzasyona eşîrtîyê avakirîye. Avakar û sazimanê vê formê Kurd.

Komelgehîya biçûk û teng li ser esasê xizmanîyê û xwîngirêdanîyê ev forma rêxistina civakî hatîye avakirin. Ev li tevayê cîhanê bû bingehê komelgehîya civakî di dîrokê de.

Her çiqas di dîrokê de dewlet avakiribin jî dewletên ku avakirine jî li ser esasê vê formê bi berfirehî bi hevgirtina eşîran avakarîyekî konfederal avakirine. Ev dewletên ku li ser hevgirtin û hevbendîya eşîran hatine avakirin ti carî di nava xwe de rêveberîyekî navendî bi rêk û pêk û şid neafirandîye.

Rêveberî her tim nabeyna xwe de otonom û sist mane. Loma jî di zîhn û mejîyê erka rêveberîyê de aqlê tekane nehatîye afirandin û aql û feraseta erk û hiqûqa dewletbûnekî navendî û yekdest hasil nebûye.

Cara pêşîn ev di nava Eyyûbîyan de hasil bibe jî di nava erkan û rêveberîyên Kurdan de ev bi temamî hivêna xwe begirt û di demek kurt de jî belav bû an jî ew hêz bi dek û dolaban ketin destê rêveberên miletên din.

**Dom heye**

# Ji Urmiyê heta Xorasanê, ji Emîr Xanê Lep Zêrîn heta Serdar Êywez





**N: Rojan Kurmanc**
**W: Hesen Mukerem**

**Beşa 1**

Taybetmendiyên Kurdên ku li dijî zulm û fesadiya dewletên emperyalîst protesto dikin, bûye sedem ku di çar parçên Kurdistanê de ji aliyê padîşahan ve bên îşkencekirin û bi awayekî hovane bên kuştin.

Piştî hatina Îslamê Xorasan bû navenda serhildan û êrîşên 3 komên wek Ozbekan, Monxolan û Tirkmenan.

Di dawiya sedsala 10`an de û di dema desthilatdariya dewleta Şîe meseban ya Sefewî de ev êrîş berdewam dikin.

Dûrbûna Xorasanê ji paytext yek ji faktorên girîng ên van êrîşan bû.

Şah Îsmaîl û Şah Tehmasib nekarîn van êrîşan rawestînin û di dawiyê de bi serketina Ebdulmo`imên Xanê Ozbek gelek bajarên Xorasanê wêran bûn û xelkê wan hatin qetilkirin, Ozbekan bajarên Damxan û Sêmnan jî talan kirin.

Di vê navberê de ji aliyekê ve êrîşên dewleta Osmaniyan û ji aliyê din ve jî nakokiyên serokên Qizlbaşan li ser desthilatdariyê bibû sebeba lawazbûna hêza Sefewiyan.

Hikûmeta Sefewî ya ku ola şîe hilbijartibû û Osmanî ku sunî meseb bûn, di warê olî de gelek nakokiyên wan hebûn û nakokiyên ku ji serdema Şah Îsmaîl derketin holê, nehiştin ku mij û dûmana şer di navbera her du dewletan de were vemirandin.

Şah Ebas, ku şahekî bi siyasetên qirêj bû, karî heta radeyekê rewşa welat birêxistin bike.

Wî xwe encamdana ti tawanekê nedioarast, ji kuştina hemû mirovên navdar ên serkirdeyên mezin ku ji wan ditirsiya, yan dikuştin yan kor dikirin yan jî dixistin hepsan, heta perwerdekirina Çîgînan yan heman mirovxwaran.

Çîgînan an jî xamxwarin, ku komeke dûvikên dîwanê bûn, ku bi fermana padîşah, êlrîşên bêbext encam didan û bi diranên xwe endamên laşê mirovan jêdikirin û dixwarin.

Lep Zêrîn mîrê Urmiyê yê wê demê, ku yek ji kurdên Bradostî û mirovekî gelek mêrxas û bicesaret bû, ku di yek ji êrîşên Osmaniyan de li ser Urmiyê û şerê ku di navbera Omer Paşa yê Osmanî û Emîr Xan qewmî, bû sedem ku destê Emîr Xan ji laşê wî bê birîn, lê bi vê yêkê jî dev ji şer berneda û ewqas şer kir heta ku Omer Paşa têk bir û reviya.



Piştî ku ev navçe ji aliyê Emîr Xan ve ji destê Osmaniyan hat vegerandin, Şah Ebbas navê Sultan û Xanî da wî û ji bilî Urmiyê Şino û herêmên derdorê, serokatiya eşîrên Baradostî jî da wî û ferman da ku destek bi zêr ji wî re çê bikin û piştre bi naznavê "Emîrxanê Lepizêrîn" hat naskirin.

**Şah Ebbas ku ji hêza zêde ya Emîr Xan Serdarê Kurd û ji pêgeha bi hêze wî di nav xelkê de ditirsiya, plana kuştina wî rêxistibû, ku hay ji merema xerab a Şah Ebbas bû, li keleha wî ya ku jê re digotin KELEHA DIM DIM 4 sal û nîv berxwedanî kir.**

Lê pirs eva ye, gelo ma 4 sal û nîv dikare bê liv û tevger û li hember dorpêçkirina dijmin raweste?

Bingehên destpêkê yên Kela DIM DIM di salî 1000 berî zayînê de hatibûn çêkirin, delîl nîşan didin ku bi demê re keleh wêran bûye, heya ku Mîrê Urmiyê Emîrxanê Bradost, kelehek bihêz li ser wêraniyên wê ava kir û wî dizanî ku padîşah ji ber tirsa wî, bavê wî û birayê wî jî di kelehekê de heps kirine, da ku li hember wê serhildanê neke û gelek caran şahidê kuştina serleşkerên navdar bibû û kelehek xort ava kir.

Keleha zexm a ku ji pênc kelehên cihên cuda pêk tê bi rezervên parastî û çalên ji bo depokirina cemed û berfê Keleha Dim Dim ji aliyê rojhilat ve ji ber bilindahiya xwe ya bilind ji aliyê bakur-rojhilat û başûr ve û girêdana wê bi zinarê aliyê rojava ve ku nêzîkî erdê ye, ji aliyê rojhilat ve têl û dergehek xurt heye.

Ava ku tê bikaranîn ji hewzekê ye ku bi ava baranê tije dibe tê peydakirin. Katibê kal Îskender Begê Qezayan dinivîse.

Ew nivîserê padîşah e, lê ew nikare tiştê ku dîtiye bi tevahî ji nivîsên xwe derxîne wî nivîsiye dora wî û siwarên wî dorpêç dikin û ji wî dixwazin ku teslîm bibe û kelehê radest bike!

Emîr Xan dema ku mêvanê Bîgdilî bû li derveyê kelehê bû, ji ber ku wî got ku ew dixwaze bi Şah re biaxive û Bîgdilî jî razî bû û her tişt baş bû, di vê navberê de Bîgdilî û kesekî din bi navê (Îlyas Xelîfe) li hîleyekê digeriyan ku Nehêlin Emîran bigihêje şah û wî bikujin) û got ku ev mêvanên me ne, çekên xwe bidin me, dema ku Emîr Xan û Xan Mukrî fêhm kirin, çekên xwe nedan û pir şer kirin, di dawiyê de, EmîrXan bi destê zilamên Bêygdilî hat kuştin..

**Dom heye**

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## “Kolber News”ê raporek li derheq kuştina Kolberan belav kir

Li rapora “Kolber News”ê de hatiye ku li heyama 70 rojan de zêdetir ji 17 kolberan ji aliyê hêzên hov ên rêjîma Îranê ve hatine kuştin ku %71 a wan bi rêya teqeya rasterast a hêzên rêjîmê ve bûye.




Pêka amara “Kolber News”ê li heyama 70 rojan 17 kolber ji aliyê hêzên hov ên rêjîma Îranê li deverên sînorî yên bajarên Rojhilatê Kurdistanê de hatine kuştin ku ji vê rêjeyê 12 kes bi teqeya rasterast a hêzên hov ên rêjîmê bûye.

Pêka vê amarê, 12 kes bi teqeya rasterast a hêzên sînorî yên rêjîmê ve hatine kuştin, kolberek bi sedema sekinîna dil, 2 kolber bi sedema sir û seqemê, 2 kolber bi sedema kevtina ji bilindahiyê li dema lipeyketina hêzên rêjîmê li deverên sînorî, canê xwe ji dest dane ku kolberekî temen 15 salî yê bi navê “Hestiyar Ebdulkerîmî, li nav vê amarê de ye.

Ew kolberane li deverên sînorî yên wek, “Newsûd, Hengejal, Mêşaw, Pîranşar, bilindahiyên çiyayê Tete, bilindahiyên Deşta Wezîne, Bestam, Belekê û Sor Kêw”ê de ji aliyê hêzên hov ên henga sînorî û spaha pasdaran a terorîst ve hatine kuştin.

## Rêjîma Îranê 60 sal girtîgeh bi ser 11 çalakvanên mafê jinan li Gîlanê de sepand

Dadgeha rêjîma Îranê li parêzgeha Gîlanê, 60 sal û 6 heyv girtîgeh bi ser 11 çalakvanên mafê jinan li parêzgeha Gîlanê de sepand.



Taya 11 a dadgeha rêjîmê li parêzgeha Gîlanê, 60 sal û 6 hev girtîgeh bi ser “Homen Tahirî, Cilwe Cewahirî, Firûx Semî`iniya, Sara Cehanî, Yasemîn Heşderî, Şîwa Şahsiyah, Nigîn Rizayî, Azadê Çawuşiyan, Zehra Dadres, Metîn Yezdanî û Zohrê Dadres” de sepand.

Ew çalqakvanên warê mafê jinan bi tohmetên wek “avakirina girûp bi armanca alozkirina ewlehiya netewî û lidarxistina kombûnan”, hatine dadgehîkirin.

Ew 11 çalakvanên warê mafê jinan li heyva Gelawêja sala 1402 a Rojî ji aliyê hêzên ewlehî yên rêjîma Îranê li bajarên “Lahîcan, Fûmen û Enzelî”yê de hatibûne binçavkirin û piştî heyamekê bi danîna barimtê û bi awayê demkî, hatibûne serbestkirin.

Wê dadgeha rêjîmê, 9 sal û 6 hev girtîgeh bi ser Zohrê Dadres, salek girtîgeh bi ser “Cilwe Cewahirî” û “Homen Tahirî”, 6 sal û 6 heyv û 17 roj gîrtîgeh bi ser 8 çalakvanên din de sepandiye.

## “Hengaw”ê li derheq binpêkana mafê mirov li Îranê raporek belav kir

Pêka rapora “Hengaw”ê li 5 heyvên destpêkiya sala 2024 a Zayînî, 592 kes li Îranê ku 301 kes ji wan Kurd bûne, hatine binçavkirin û 243 kes hatine bidarvekirin ku 72 kes ji wan welatiyên Kurd bûne.



Rêkxirava Mafê Mirovî ya “Hengaw”ê bi belavkirina raporekê daye zanîn ku li heyama 5 heyvên destpêkiya sala 2024 a Zayînî de li Îranê, 592 kes ku 301 kes ji wan welatiyên Kurd bûne, hatine binçavkirin û 243 kes jî li Îranê hatine bidarvekirin ku 72 kes ji wan welatiyên Kurd bûne.
Herwisa li vê raporê de hatiye ku li heyama wan 5 heyvan de 35 kolber hatine kuştin û 223 kolber jî hatine birîndarkirin.
Pêka vê raporê, li girtîgehên rêjîma Îranê de, 15 binçavkiriyan, canê xwe ji dest dane ku 8 kes ji wan girtiyan welatiyên Kurd bûne û 78 haletên kuştina jinan jî hatine tomarkirin.
Herwisa Hengawê belav kiriye li wan 5 heyvan de 53 jin hatine bibnçavkirin û cezayê girtîgehê bi ser 61 çalakvanên jin de hatiye sepandin.

Herwisa 10 jin û zarokek jî hatine bidarvekirin û 22 zarok jî hatine binçavkirin û 17 kolberên zarok jî bûne qurbanî.

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (471)

